Çima

Şîlan Hemo

Şev
Ji bo xelk xewnan bi hunin
Pirê caran şev tê

Baran
Ji ber ahîna van ewran
Pirê caran asîman dibare

Helbestvan
Helbestê di nivîsîne ji ber ku helbestvane
Çend sitiran nav nîşan bûn
Kanyê
Gulê
Girinjîna vê zarukê
Van çîyayan ew helbijartin

Rok
Ew dirin ava
Keske sorê wana di stirê
Befira çîyan
Sema gulan
Xwendina çeman
Sirudên xewn û xeman

Stêr
Ji ber ku stêrin
Şev wana himbêz dike
Heyiv û hêvî
Ji wanare vê namê rêdikin

Duhok
2007